
# SINDIRÛKA NUWAZE YA NIŞTECIHÎ



# NAVEROK

01

Sindirûka Nuwaze ya Niştecihî

02

Sindirûka Amedê

03

Pêşangeh

04

Wanek û Çîrok

05

Tîp



# SINDIRÛKA NUWAZE YA NIŞTECIHÎ

Sindirûka Nuwaze ya Niştecihî, li Amed a Anatolîyayê û nexasim jî li bajarê me yê kevn Sûrê, heyberên derbarê windabûna mîrateyên çandî nîşan dide û çîrokên wê vedibêje.

Ev pêşangeh ji  encama civîn û hevdîtinên bi niştecihên xwedî raborî û temenên cihêreng re hatî berhev kirin, armanca vê pêşangehê parvekirina nuwazeyên herêmî ye - yên ku hatine paşguh kirin, tune hesibandin an ji mêj ve winda bûne. Bîranînên ku em kî ne û em dikarin ji rabirdûya xwe çi fêr bibin dihewîne. Her heyber xwedî çîrokek e: ji keşfkirina wan kêfê bistînin!

Sindirûka Nuwaze ya Niştecihî, pêşangehek dewlemendiya herêma me ya sosyo-kulturel belge dike û parve dike. Heyberên ku di dolabê de têne pêşandan, ji hebûnên çandî yên şênber û razber pêk tên. Û çîrokên girîng ên herêmî yên qadên jiyana dîrokî û hemdem û bîranînên ku li ber xwe dane vedibêjin. Ev heyber bi qasî serpêhatî û nasnameyên li herêma me cihêreng in - hûn ê heyberên girêdayî xwarinên herêmî û girêdana wê ya bi jiyana mirovan re eleqedar, nebatên bi nirx ên herêmî ku gelek warên jiyanê bandor kirine, tiştên ku bi pratîka xwedîkirina kevokan a domdar a li bajarê kevnar yê Sûrê ve girêdayî ne, û hunera "Deq"ê bibînin.

Heyber û çîrokên di pêşangeha dolabê de ne mijarên wekî koçberiya bi darê zorê, adetên çandî yên nedomdar ên berê, û guhertina tevna bajêr û gundan ji ber bandora bûyerên siyasî ên li ser jiyana civakî û aborî vedibêjin. Bîranînên bajarekî ku li dijî dem û wêraniyê li ber xwe daye dişayisîne,  şop û girêdanên civakî yên jiyana mirovên li Sûrê nîşan dide. Karekterên wê yên helbestî, pêkenokî, karakterê wê yê xemgînî an yên jirêzê ku pirê caran têne paşguh kirin û ji ber vê yekê têne jibîrkirin dideribîne: ew bi nuwazeyên herêmî yên ku di hawîrdora me ya xwezayî û civakî de zanyarî, zanîn û ezmûnê di xwe de dihewîne ve mijûl dibe. Dema ku hûn li dora vê pêşangeha piçûk digerin, mîrateya çandî  ji ber şert û mercên sosyo-polîtîk û kêmbûna mirovên ku bi berdewamî  vediguhezînin roj bi roj winda dibe.

Sernavê pêşangehê ji  "Dolaba Ecêbiyan" an "Wunderkammer" ku prototîpa yekem a muzexaneyên îroyîn e tê. Cûdahiya Dolaba me ji formên pêşangehên klasîk ên din ev e ku ew mêvanên me vedixwîne ku bigerin û bi heyberan re têkilî deynin, tevlihev bikin, guhdarî bikin û çîrokên derbarê wan de bixwînin, di heman demê de tev li çarçoveyek civakî bibin - derfeta kesên din ên ku meraq û coşa bajarê me yê kevnar dihewînin jî beşdar bibin.

# SINDIRÛKA NUWAZE YA NIŞTECIHÎ

## Amed



Sindirûka Amedê di navbera 20'ê Hezîran û 3'ê Tîrmeha 2022'an de li navenda bajêr li Navenda Hunerê ya Mordemê hat pêşandan.

Her tişt bi çîroka ku diviyabû bigota pê re bû û li ser kartên şîrovekirî yên bi wêneyan hate çap kirin. Mêvan dikarin van kartan li gel xwe bigrin. Bo pêşerojê wê pêşangehên dîtir li Amedê û li hewridorê were lidar xistin. Ji aliyê Mordem Huner ve jî bi lîstikvanan ku li bajarê kevin (Sûr) çîrokan vedibêjin, sazkirina performatîf jî tê plankirin. Ger we xwest dolabê li cîh an li dezgehên xwe nîşan bidin li gel tîma me peywendîdar bin.

# PÊŞANGEH

## Navenda Hunerê ya Mordem- Amed












# WANEK Û ÇÎROK



# 01

## SIMBIL


Dema min danîn hewşa mizgeftê, hewşa min a bi deriyê mezin ê zer û bi dara mêwê û dara gûzê ve bibû mala min. Ji roja melayê mizgefta ku min lê danîbûn, min di hewşa xwe ya mezin û malbata xwe de bi cîh kiribû, ez bawer dikim ku warê min nav pirtûkên kevn ên pelên zer û bi bîhna kayê ne. Hemî mala min tînin bîra min. Maleke ku girse di hewşeke de dijîn û tê de hevoka ez ji te hez dikim nayê gotin lê her kes bê şert û merc ji hev hez dike. Tu kesek hewcedarî bi gotina “ez ji te hez dikim” nabîne. Gundê ku ez lê mezin bûm zeriya genim tîne bîra min. Em li wir di nav ka û kapolê de mezin bûn. Ew rengê şemamokên, fena rengê hilatina rojê zer her dem xweş e. Ji bo xera nebin me şemamokên xwe di nav ardê ku ji genim dihat çêkirin de vedişart û li hewşê di bin stêrkan de diketin xewê. Niha em stêrkan nabînin. Bi şev em tenê tariyê dibînin. Tişekî din nîn e. Piştî wê... Beq. Di nav rezên me de beq hebûn. Di destên min de babelûk derdiket. Qaşo ji ber ku me dest bi beqan kiriye.Tirsa me ya herî mezin derketina babelûkan di destên me de bû. Dapîra min bi dia ve heft caran genim li dora babelûkan digerand. Dîsa me hêviya şîfaya xwe ji genim dikir. Hewşa me ya ku genim dibû ard, ax û şîfa, di hişê min de pirr mezin bû. Piştî salan ez çûm wê hewşê. Lê hewşek piçûk bû. Nexwe gav û tirsa me jî biçûk bû. Li şûna wî deriyê zer yê mezin û bedew bi yekê hesinî ve hatibû guhertin. Dê û bavê min ên deriyê wê malê ji min ra vekiribûn, hewşa wê bibû warê min, li wir çûbûn ser dilovaniya xwe. Kevirên wê hewşê qîrîna zarokatiya me û nalînên me jî bihîst. Her hal niha di bêdengiya de ye. Ew dara gûzê û mêwê hê jî li wir in. Ew tenê nehatine guhertin. Û kevirên hewşê.



02

## TASA HEMAMÊ


Niha ez zêde bi çanda hemamê nizanim. Tiştên ku ez dizanim, ez ê bêjim. Amed xwedî çanda hemamê ye. Yanî ger îro firsenda min hebûya, min ê vê derê bikira hemam. Bi gelemperî, kêfa hemamê, şahî, paqijî, henek û civakîbûna wê ye. Yano wê wek çanda qehweyê bihesibînin. Ger hûn bi 4-5 hevalan re biçin cîhek şahiyê, hûn rûnin û sohbet bikin, bikenin, kêf bikin, çanda hemamê jî wiha ye. Armanc ew e ku em li hev bicivin, hirboqê bikin, şemate bikin. Niha di hundurê mala me de hemam heye xwedêgiravî navê wê hemam e, em banyo dikin lê navê wê banyo y. Ji ber vê yekê kêf û zewqa ku hûn ê li vir wergirin, li malê hûn çiqas banyo bikin jî, hûn ê nestînin, bi xwe ez nastînim. Ji ber vê yekê çanda hemamê pir cuda ye. Dengê wan manîyan, dengê wan keviran, ew qêrîna “ava germ nehat” (dikene), yê din digot nizanim çi çênebû. Yano bîranînên wan pir xweş in. Lê, niha tiştek di bîra me da nema. Di xortaniya me de gelek hemamên me hebûn. Ger niha heba, dê me niha behsa wan nekir. Yên ji me zanatir, yên çêtir dizanîbûn, wê baştir rave bikirana. Li Amedê hemam tune. Li Sûrê nîn e. Niha mixabin em bûne xerîbên bajêr. Heya ku em ji malê derdiket û diçûn ser kar me wek leşkeran silav dida, te hew didît rê diqediya. Çima em niha silavê nadin dikandaran? Ji ber ku em hev nas nakin.



# 03

## QUTÎ


Hin caran dema dê û bav li kevokan nenêrin, ez wan tînim li dikanê û di sindoqê de mezin dikim. Çend kevokên me hene ji ber ku nikilê wan biçûk in, nikanin bi vereşînê çêçikan têr bikin, em dibêjin nikarin verêşin. Ji ber ku nikarin xwarinê bidin wan çêçikan piçûk dimînin û heke hûn lê xwedî dernekevin, û mudaxele nekin wê bimirin. Kevok her tim ji bo min xwedî cîhek taybet e. Evînek cuda ye, carna meriv bi malbatê ra pev diçine û der tê an meriv ji der aciz dibe û diçe nava wan du saet tameşe dike bêhna meriv der tê. Birader me yê li wê derê dîkên şer xwedî dike, yanî bazirganiya wan dike, dide şerkirin, komeleya wan heye û xwedêgirawî jê re dibêjin komeleya parastinê, lê wan dîka dide şerkirin, yanî ew yek ji wan kesên ku dibêje ez nakim lê dike wek partiyên siyasî bifikirin... Ma tu naxwazî bibî çivîkek, ji ber vê yekê ez difikirim ku her kes dixwaze bifire... Ez ti car ji kevokan dûrneketim. Ez tenê di eskeriyê de ji wan dûr mam lê dûre ji bo leşkerên bi nexweşiya dêrûnî ya antîsosyal re pînek hat çêkirin, kevok tê de hebûn, min berpirsiyariya wan girt ser xwe. Di wî şerî de kevokên me hebûn, li vir xendek çêbûn, ez hatim vir, mala min li vir bû, roja duduyan hatim, dema hatim min bi zorê destûr ji polîsan girt. Li serê kolanê min bernedan, min ji wan ra got ez nehiştim, min got kevokên min li vir hene û hinekan jî digotin tiştên me li wir hene, min jî got kevokên min hene ez ê wan derxim. Carek gotin erê carek na lê axir destûr dane min. Ez çûm, min du-sê satil av tije kir, derê wan vekirî hişt û torbeyek êm li ber wan rijand û min dilê xwe da got kîjan rizgar dibe bila bibe. Kevokên apê min jî li vir hebûn, nav xendeqan min bivirek dît, û min dîwarê mala apê xwe ruxand û derîyek tê da vekir. Ketim hundur, min hemî kevok xist qutîyekî derxist bir gund. Gelek kevok ji birçîna mirin. Li wir dost û biraderên me hebûn kevokên wan hemî mirin. Ka ma azadiya me tune, azadiya me ya herî xweş li cem kevoka ye. Kavokên ku ez wan di vê dikanê da xwedî dikim, ez ê deh rojên din jî wan xwedî bikim û dawî bibim gund wê xilas bibin. Ger di qutiyê de li gel hev bin wê hev germ bikin.



04

## ŞARPE

Ez bi eslê xwe ji Dêrika Çiyayê Mazî me. Cara ewil e jinek ji eşîra me tena serê xwe di malek de dijî. Min zahmetiya wê dît. Ez di jiyana xwe de tu carî ji bîr nakim, yekem car min li Stembolê bîra vedixwim. Ez li perava modayê me, ez bi tena serê xwe me. Serê min bi şarpê niximandî, min tuborgek sor kirîbû. Ew tuborga sor li cem min xwedî cihekî taybet e. Ji ber ku min di jiyana xwe de qet alkol bikar neanîbû, ez pê ra mest bûm. Ez bawer nakim ku ji tesîra alkolê be. Dûv re ew bîra xilas bû, ez ber bi êêê ve çûm, ber bi peykerê ga ve çûm. Her çiqas ez di mala cimaetê de bim û her çendî min berteka malbata xwe ya piştî serî vekirinê zanibû jî min şarpeya serê xwe derxist. Xwedayo, dema ku ez qala wê dikim jî ji bo min demek pirr cûda bû. Pirr cuda bû. Mîna ku di wê kêlîkê de çira ronî bibû, her kes bi serê xwe dimeşe, ez porê xwe vedikim û li ba dikim. Min milên xwe vekir, lê ez çawa xwe ewqas azad hîs dikim. Ew roja yekem bû ku min serê xwe vekiribû. Êdî malbata min çawa fêr bûye, diya min û xwişkên min l imin digerin û dibêjin, "Tu çûyî wir, tu ji rê derketî, wisa neyê malê", lê ev ne ji bo bedewiyê bû.  Porê min ewqas dirêj û gur bû ku min êdî nikarîbû rakim. Ez bi girî çûm kuaforê û min porê xwe da jêkirin. Min ji wê rojê şûn ve êdî porê xwe dirêj nekir. Erê, di demekê şûn ve elimîm, ev mijarek cuda ye, lê jêrenota wê ne rehet bû. Dema ez biçûk bûm, diya min ji min re gotibû serê xwe bigre, min jî girtibû. Fikra min û wê şarpê nelihev bû. Vî şerî 6 salê min girt. Ez dikarim ji malbata xwe re qala dildarê xwe bikim, bavê min dibihîze. Ma ez kî bûm ku hevalê min hebe. Tuyê bihetikiya û navê te li gund derdiket. Niha ger hevalên min werin, ez ji bavê xwe re dibêjim, ew hevûdu dinasin, çend rojan li gund li mala me dimînin. Me hevdû gelek êşand, me gelek şer kir, encam wiha bû. Mînak, tişka ku ez jiyam wê xwişka min nebîne.



# 05

## MIRTOXE


Di destpêka salên 90î de li ser Kurdan zextekên mezin hebû. Wê demê ji ber van zextan leşkeran gund şewitandin. Rojekê dema ku me xebera şewitandina gundê me girt, me hinekî ard, xwê û rûn bi xwe re bir û em ber bi çiyayan ve reviyan. Di wê rêwîtiyê de dema ku zarok ji birçîna giriyan, dapîra min û pîrejinên gundê me li cihekî agirek biçûk pêxistin û bi ard, xwê û rûnê ku me bi xwe re anîbûn ve "mirtoxe" çêkirin. Me navberên piçûk dida û bêhn vedida û di nav çiyayan de reva me berdewam dikir. Piştî meşek qederê 8-9 saetan em gihîştin gundên li serê çiyê. Li vir ji bo me ewle bû. Ji ber ku leşker nekarîbûn werin gundên serê çiyê. Hemû gundên li ser rê hatibû şewitandin. Cihê ku em biçin tunebû, me jî tunebû me jî koçî navenda bajêr kir. Me dest bi jiyanek mişt bi xizanî kir. Malbata min 7 salan nikaribûn vegerin gundê xwe. Ger gundê me, bax, dar û sewalên me nehatiba şewitandin, niha rewşa malbata min gelek baştir bû. Roj hebû me nedikarî mirtoxe jî çêbikin. Ard hebû, rûn tunebû, rûn hebû, ard tunebû. Çend şevan min dît ku diya min bi tena serê xwe digiriya dema herkes di xew de bûn. Bi salan e ez nikarim mirtoxê çêkim, çênakim. Axxxax gelek zdijwar bû, ez qet ji bîr nakim. Mîrtoxe tê wateya koçberî, feqîrî, şewitandina gundan, bêhna şewatê, rondikên zarokan, feryada dayikan, axîneke mezin.



06

## KEVIR


Min keviran jî neavêtî, kevirên ku ji vir derketine neavêtî. Mînak, wan defînegeran kolandine, li her derê kevir hene. Min kevir jî neavêtin, min hemû danîn pişt odê. Min got wê lazim bike. Armanc ew e ku sibe gava kesek were bila li ser pîya bimînin. Li vir 3 sal derbas bûn, çop û toza vê derê. Yano ez bi saxî ketimê, li vir nexweşiya KOAHê ketim. Xeyala min ew e ku vegere ser halê xwe yê berê. Bo xizmeta gel ra vebe. Dibe ku bibe hemam an bibe muzexane, an jî navendek çandê. Bes tenê bila gelê me were wê bibîne. Armanca min ev e. Bila bedewiya welatê me bibînin. Jixwe hinê me nebaş nîşan dane êdî me wek beho dibînin. Bila werin yaw bibînin, bila dîroka me bibînin, bila çanda me bibînin. Min got, em bi kêmanî çanda xwe biparêzin, armanca min ev e. Min ev der kirî kafe jî, armanca min tenê ji bo parastina wir bû. Ew bi rastî jî min qet aciz nake. Her cîhê ku lê dinêrim bêhna min fire dike. Hûn bawer bin ez pir bextewar dibim. Yano ez zewq digrim. Belkî ez jî dîn bûbim, lê haya min jê tune. Jixwe kesên li Taxê akincî ne dibêjin Cûmalî li vir dîn bûye. Ji ber vê yekê ez li vir hemalekî dildar im, nobedarekî dildar im. Wextê li van dinêrim, ez dikarim wê şahiya ku ez ji neviya xwe werdigrim ji van de werdigirim. Loma ez evîndar im.




# 07

## KASÊT


Di nav kurdan de çîrokên wiha pirr in, hema hema li her malê hene. Ên ku bandên xwe dixistin bin axê, yên pirtûk nav qul û terkên dîwaran de vedişar... Yano pirtûk dixist nav û di ber da dîwar lê dikirin. Piştî salan wextê lê dinêrîn, didîtin ku mişkan hemî xwarine. Wekî medreseya Aqtepe, gelek çîrokên me ên wiha hene. Salên 90î li Amedê diavêtin ser malan, hinek buyer diqewimîn. Li mala me jî pirtûk hebûn. Rojekî min bê xebera malbatê pirtûkên xwe xist valêzekî. Min ji xwe ra got li mala pîra min wê kê lê mêze bike, pîrejinek e. Min got çi dibe çi nabe, bêyî ku xebera pîra min jê hebe min pirtûkên xwe bir mala pîra xwe û nava sîwanê de veşart. Lê bavê min dîtibû. Bavê min ji bo ku me biparêze bi dizî wan pirtûkana şewitandibû. Hemî pirtûkan bo tevdîrê dişewitîne. Dawî rojek ez çûm li pirtûkan binêrim, min dît ku nîvê pirtûkan tune. Û min pirtûkên xwe ên ku mane bir cîhekî din veşart. Piştî wextek dûr û dirêj, dema ku me ji bo restorasyonê dest bi kolandinê kir, me pirtûkên ku di hundurê bircê de hatine veşartin dî. Nava bircê ji kavilan tê paqijkirin û dê bê restorekirin. Di nava wî kavilî de pirtûk hatin dîtin. Gazî min kirin, min bangî wan kir ku tavilê îmha bikin. Ji ber ku li derdorê karker hebûn. Piştî wê min bi dizî ji xortê ku li wir dixebitî ra got ku wan kom bike û bîne cem min. Min ew restore kirin. Pirtûkên ku min xilas kir hîn jî di pirtûkxaneya min de ne.




# 08

## BILÊTA OTOPARKÊ


Hestên min ên bo aîdiyeta Sûrê, û bo bajêr pir pêşketiye. Ji ber vê yekê min jiyanek li derveyî Amedê plan nekir. Min heta sala 2015an wextê xwe yê vala timî bi gera li kuçeyên Sûrê û kolanan ve bihurand. Her cara ku ez diçûm kolanan min tiştên nû kifş dikir. Ji ber ku zarokatî, ciwantî û jiyana min a xebatê li vir derbas bûye, her cihê ku ez diçim, teqez bi bîranînekê tê da heye. Mînak, zaroktiya min da dema ku ez di Anzelê re derbas dibûm, ez her tim digiriyam, "ez jî bi wan zarokan re têkevim avê". Diya min nedihişt ez têkevim hewzê, ew hertim di bîra min da bû. Sermeselê, mala ku dapîra min lê dima, maleke kevn a Amedê bû. Xaniyek xweş bû. Ew avahiyek dîrokî ya pir mezin bû hewşek mezin bi du kolanan de vedibû, du deriyên wê hebûn. Ew xanî bom in her tim mîstîk dixuya. Di dawiya salên 70î de li Sûrê dest bi hilweşandinê xaniyên kevin kirin û li şûna wan apartman hatin çêkirin. Mala me niha wekî oto park tê bikaranîn. Li dewsê oto parkek mezin çêkirine, perçeyek piçûk jê maye. Ew jî bûye dikan. Dilê min tehemul nake, li wir park nakim. Pêvajoya ku herî zêde min êşandî hilweşîna Sûrê bû. Niha ne mala ku ez lê ji dayik bûme, ne dibistanek ku ez çûme, ne jî kuçe hene. Ez nemirime ku gora min hebe. Tiştek zêde nemaye ku têkiliya min bi bajêr re îspat bike. Eşkere ye ku wê wêraniyê hestê min ê girêdayîna bi bajêr qels kir. Ez carînan difikirim ku gelo ez biçim.



09

## HEŞTGOŞE

Ez vê hemamê wek kefa destê xwe dizanim. Ez di her quncikê wê de xebitîm. Binêrin, wek nimûne, wir cîhê paqijkirina laş e, donim û sêsed metreçarçik e. Û heştgoşe ye. Her tim heştgoşe ye.
Belê, li jor heşt pencere hene, heşt qubeyên wê hene, heşt kevirên ku bi gavan meriv li pêlê dik diç hewzê. Hûn çûn ser wî kevirê navikê. Min wir paqij dikir, min gazî zarokan kir. Dengek ecêb hate guhê min, ez tirsiyam. Ez pengizîm. Zaroktiya min hate bîra min. Min ji xwe ra got, dayikên me digotin li hemaman cin û perî hene. Ew gotin hate bîra min. Ez sekinîm û min bala xwe da hêla rast û çep, kesek tunebû. Zarok dixebitîn "ellah ellah". Careke din ez derketim, careke din dîsa eynî deng. "Law, hela werin vir, derkevin wir. Wele dengê ecêb ji vir tê guhê min". Kekê me ew jî fam kir. Hevalek li beramber rûnişt, min jê ra got "Yilmaz wê qedehê dirêjî min bike". Got "kekê guhê min teqiya". "Çi bû law?". Min nihêrî rastî jî "law, dengê te jî guhê min teqand". Yano me nizanîbû. Dawî min ev yek lêkoland. Ez jî li gorî xwe lêdikolim. Min dibistana seretayî xilas kirî, ez di girtîgehê de fêrî xwendin û nivîsandinê bûm.



10

## DEQ


Li gundê me çend xaltîk hebûn. Li ser çenge û rûyên xaltîkan motîfên deqan hebûn. Meraqa min bi vî awayî dest pê kir. Bersiva wan min têr nekir. Vegere ser kok û eslê xwe... Wextê min bixwesta deqan li çenga xwe bikim, min bi qelemê xêz dikir. Min dixwest Deq wek gerdenek hertim di stûyê min da be. Wê demê motîfa rojê tim bala min kişandibû. Hin motîf hene, bi hin rîtuelan tê çêkirin. Dem amin ji diya xwe ra qal dikir, ji min ra gotibû "tu bûyê qeşmer". Vê yekê, bi min ra hesta ev laşê min e an ev jiyana min e, hûn nikarin mudaxele bikin çêkir. Ez Deqê wek perçeyekî ji laşê xwe hîs dikim. Hesta ku wek di cihekî de carek din hefs bûyî, tu di qalibekî de yî û ew qalib li te teng bûye û tu jî dişikînî. Çendî tirsnak e ku te dîsa di nav wê qalibê de bitengijînin. Deq rengekî serhildanê ye. Bi rêya Deqê min azadiya xwe îlan kir. Rojekê min di dolmîşê de xaltîkek dît. Wê motîfek nas çêkiribû. Min jê ra got te çima çêkirî? Û min jê ma'neya wê pirsî ? [Got ev] Komika sêwiya ye, Xaltîka min ji min re çêkirî. Komikek ya sêwîya ne. Wateya wê li gor herêmê diguhere. Mînak, jineke din hebû ku li hundirê kefa destê xwe û li pişta destê xwe motîfek sê xalî çê kiribû. Min jê pirsî çima te çêkirî. Got Welle, ji bo hewî neyê ser min, min çêkir Îcar te çima li pişta destê xwe çêkir? "Êêê, welle hewî hat ser min, min careke din çêkir. Piştî wê dîsa hewî hat.



11

## ZÊR

Li Stembolê dema min dest bi kar kir ez 12 salî bûm. Zirfiroşî pîşeyek bû ku min qet li serê nefikiribû û ne jî xeyal dikir. Min bêyî ku bizanibim zêr çi ye dest bi vî pîşeyî kir. Birayê min rojekê got ku birayê mişteriyek min kargeha wî ya zêrkariyê heye, xebatkarek jê re lazim e, ger tu bixwazî were li wir bixebite. Zêrkarî ji min re karek bi efsûn bû. Min ji şikandina tiştan û ji nû ve çêkirina tiştan hez dikir. Min jî got erê. Serê sibê di rê tiştekî wiha qewimî; Min û birayên xwe destê hev girtibû, em ji Aksarayê daketin, dema em li benda derbasbûna otomîlan bûn çûkek li ser serê min zîlq kir. Ha haha, min destê xwe da ser serê xwe û nihêrî. Birayê min bi ken destmala xwe derxist û got ev siûd e. Êdî pîşeya te ev e, xilasiya te tune. Got te karên din kir, êdî pîşeya te ev e. Binêre, çûkê jî li ser serê te zîlq kir, xilas. Em piştî wê çûn, ew hestek cûda bû, hestek xweş bû. Piştî erdheja sala 99an dîsa mala me hat Amedê. Xewna me ya mezin bû ku em vegerin Amedê ji ber ku Amed jiyana me bi xwe bû. Li vir kargehek hat vekirin û ji wir hosteyek lazim bû. Min di atolyeyê de dest bi xebatê kir. Paşê karsazê me yê ku ez jê re dixebitîm kesek kuşt û ket girtîgehê, min jî kargeha xwe vekir. Bi awayekî fermî, êdî kargeha min hebû. Me bi tîmeke 3-4 kesî ve dest pê kir. Paşê me tîmek ji 25 kesan pêk tê ava kir, heta Şerê Sûrê em tîmeke xurt bûn. Em neçar man ku dîsa kargeha xwe bigrin. Di sala 2016an de, bi qasî 5-6 mehî piştî ku bûyerên Sûrê bi dawî bûn, me ji bo hewldanên bazirganiyê, têkoşîna tevlîbûna jiyanê dest pê kir. Belkî em li bendê bin ku çivîkek din li ser serê me de zîlq bike.



# 12

## PEYDOK

Dê ji bo projeyek şanoyê auditionek bihata çêkirin. Ev proje li ser koçberiyê bû, û wan li wir ji min pirsîn ku koçberî bo te tê çi wateyê. Min wiha lêvegerand û got: "tiştên eletexmînî tê avêtin nav romorka traktorek ku di tariyê de wê nizanibe biçe ku ye" Di sala 1985an de dema ku ez 3 salî bûm, me ji Licê koçî gund kir heta 10-11 saliya xwe, yanî heta ku em neçarî koçberiyê bûn. Li gund sewalên me hebûn. Min şivantî dikir, me bi piranî pêdiviyên xwe ji xwezayê pêk dianî. Rojek wexta min sewal diçêrand, gelek cemsênn leşkerî hatin gundê hember û helîkopter ji jor de miletê gulebara dike. Ez bêbizav temaşe dikim. Yên ku dikarin birevin ber bi girê ku ez sewalan lê diçêrînim direvin, hinek ji wan birîndar û hinek jî xizmên xwe yên mirî li kerê dikin û hewl didin birevin. Kiryarên hovane li ber çavên min diqewimin. Gund bi temamî şewitî, lê ez bê bertek temaşe dikim, ji ber ku hê 10 salî me nizanim çi bikim. Ji nişka ve min dît ku dê û xaltiya min ji dûr ve jî ber bi min ve tên. Bi îşareta destan bang li min dikirin, dema min wan dît, min ber bi wan ve bazda. Diya min bi îşaretan ji min re got ku nerevim, lê min fêm nekir, lew ji dengê çek û bombeyan bihîstina wan zehmet bû. Di navbera me de hinek mesafe hebû, ez bi qasî 150 metreyî bezîm, dengê reşandina guleyan li pişt min hat. Tu nabê ku ji qereqola nêzî gundê me gule li min reşandin. Du sê roj piştî vê bûyerê leşker hatin gundê me û ji birayên min re gotin, yan hûn ê bibin cerdevan an jî rewşa we wê bibe wek ya gundê li hember. Birayê min got em cotkar in, em cerdevaniyê nakin, lê serfermandar got em ê di nava 2 rojan de vegerin, yan hûn ê çekên xwe bigirin û bibin cerdevan an jî dawiya we jî wiha bibe û çû. Me nîvê şevê hemû jiyana xwe eletexmînî avêt romorka traktorê û mîna ku di tariya şevê de winda bûbin bi rê ketin.

# TÎP

Koordînasyona projeyê û rêveberiya atolyeyê
Marko Heinke • Savaş Işık • Valentin Schmehl

Rêvebiriya projeyê, xebata nivîsê, sêwirana grafîkî, edîtorî
Cansel Deveci

Beşdarên projeyê
Ayşe Baykara • Baran Güven • Ceren Kılıç• Evin Turhan • Kadir Esmer • Loren Elva • Minal Karadoğan
Mustafa Zeren (Sîba) • Ömer Karadeniz
Vaha-Tîp: Bengi Aslan • Veli Başyiğit • Selim Özadar

Sêwiranâ pêşangehê
Baran Güven • Savaş Işık

Xebata nivîsê li ser malper û katalogê
Baran Güven • Cansel Deveci • Minal Karadoğan • Valentin Schmehl

Werger
Dr. Alan Bern • Bernas Qerejdaxî • Cansel Deveci • Selim Özadar • Valentin Schmehl

Grafîk û Îlustrasyon
Sumru Yılmaz

Hevkarên projeyê
Mordem Huner • Other Music Academy e.V. Weimar • Stadtforum Altenburg

Spasiyên taybet bo hevkarên me ên projeyê

Diyarbakır / Amed

2023

# SPAS

Sindirûka Nuwaze ya Niştecihî- AMED projeyek nifşê duyemîn e ku di çarçoveya Qonaxa Belavkirina III ya VAHA de bi hevkariya Mordem Huner, Other Music Academy û Stadtforum Altenburg pêk tê. Projeya Kabîneya Orjînal di navbera Komeleya Kültür Rotaları, Antalya Kültür Sanat, Other Music Academy, Futura û Stadtforum Altenburgê de wek hevkariyeke navneteweyî hat kirin.

Ev proje ji aliyê bernameya VAHA ve tê fînansekirin. VAHA, Anadolu Kultur ve MitOst e.V. Înîsiyatîf ji aliyê Stiftung Mercator û European Cultural Foundation ve tê fînansekirin. Konsorsiyûma VAHA bi iac Berlin re ji bo atolyeyên tematîk û civînên torê, û Weqfa Chrest ji bo lêçûnên rêwîtiyê re hevkariyê dike. .

VAHA bernameyeke du-salî ye ku ji bo û bi ekîbên ji cihên serbixwe yên çand û hunerê re dixebitin ku li bajarên Tirkiye, Ewropa û welatên cîran nîqaş û diyaloga giştî pêşve bibin. VAHA ku cihêrengiya mekanên hevbendî û lêgerîna çareyên çarenûsî ji bo qeyranên demokrasiyê yên ku welatên herêmê tê re derbas dibin, tîne cem hev, VAHA destnîşan dike ku piştgirîya ji bo azadiya derbirînê û platformên bernamesaziya çandî bi pêş bixe, dema ku hêza fêrbûna ji pratîkên herêmî kifş dike. . Nêzîkatiyên alternatîf û pevguhertina ramanan di çarçoveya aboriyên veguherîner û hevgirtin û piştgirîya navneteweyî de bingeha xebatên VAHAyê pêk tîne. Armanca bernameyê ew e ku ekosîstemek ji mekanên herêmî çêbike ku dê sûdê ji civakê re werbigire wekî ocaxên ku bi hevûdu ve girêdidin, û peydakirina çarçoveyek ku rê dide van deran wekî erdên bi bereket ku mekanên diyalogê vedikin berfireh bibin. Aktorên afirîner li van qadan û derdora wê beşdarî pêvajoyê dibin da ku li ser pratîkên pergalê ramanan biguhezînin, hewldanên xwe yek bikin û bi hev re bi hev re bimeşin.

Bo hûrgilîyan: www.vahahubs.org

